



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 22

Pêşiyên Kurdan yên zagrosî (1) Êlamî: Nav û Rah

Dema min agahdarî ji jêderan dicivandin wek amadekarî ji bo nivîsandina pirtûka "**Dîroka pêşiyên Kurdan**" ku di sala 2013-an da hate weşandin, min li ber destê xwe ti belgeyên hêja nedîtin ku ez "*Êlamiyan*" têxim bin babeta "**Pêşiyên Kurdan**". Xuyaye ku helbestvanê Kurd seyda Cegerxwîn jî bi vê mijarê ra rû bi rû mabû; wî nivîsandiye: "**Êlamî nakevin nav şaxên pêşiyên Kurdan**"¹.

Lê bdelê, piştî ku ez di lêkolînê da berfireh çûm, min pir belgeyên erdnîgarî, çandî û nijadî dîtin yên piştrast dikin ku *Êlamî* jî şaxekin ji pêşiyên Kurdan; û wê şaş be ku em wan paşguh bikin. Ka em dest bi lêkolîna li nav, û li rah û koka wan bikin.

Yek - Navê Êlam:

Êlam (Îlam) di dema niha da parêzgeheka biçûke û li rojhilatê Kurdistanê ye (di nav dewleta Îranê da ye). Firehiya rûerda wê dora 19000 km² û paytextê wê bajarê Êlam'e. Sînorê wê ji aliyê rojhilat da parêzgeha Loristanê ye, û ji aliyê rojava da qeza Xaneqînê ya Herêma Başûrê Kurdistanê ye. Ji aliyê bakur da parêzgeha Karmanşahê ye û ji aliyê başûr da parêzgeha Xozistanê ye ku di jêderên erebî da bi navê "*Ehwaz*" hatiye û niha jî nav lêkirine "*Erebistan*". *Êlam* li rojavayê beşê başûr yê Kurdistanê mezin dikeve.

(Li nexşeya parêzgehên Îran û nexşeya Kurdistanê mezin temaşe bike).



Êlamiyan ji welatê xwe ra digotin "Haltamtî" (Heltamtî). Sûmeran jêra gotine "Elam" (Êlam) û herwisa jêra "Nim" (Nîm) jî gotine. Ev nav bi zimanê sûmerî tê maneya "erdê bilind" (Sirt, tepe). Dibe ku şewazê "Êlam" yê sûmerî peywendiya xwe bi bilindbûnê ra hebe. Akkadiyan jêra "Elamu" (Êlamû) û "Elamtu" (Êlamtû) gotine. Di nivîsên Êlamiyan da bi şewazê "Khawirti" (Xawîrtî) hatiye û Yûnanan jêra gotiye "Sûsyana" li gor paytext "Sûsa". Di jêderên farişî da bi şewazên "Uvaja" (Ûvaja) û "Huvaja" (Hûvaja) hatiye gotin. Ev jî bingeha şewazê erebî "Hûz/Hûz/Xûz"-e (هُوز/حُوز/خُوز) ku bi gelembarî jêra "Ehwaz" (أهواز) gotine. Herwisa jêra "Xûzistan" yanê welatê "Xûz" jî gotine. Beşê çiyayî yê wî welatî wek "Anshan" (Enşan) û "Anzan" (Enzan) dihatê binavkirin².



Bi gelemperî du aliyên balkêş di şêwazê navê "*Êlam*" da hene:

Yekem: şêwazê "*Êlam*" ji şêwazê bingehîn "*Haltamî*" (Heltamî) hatiye wergerandin. Helbet mebest jê "Erdê Bîlînde" yan jî "welatê astbilînd". Bi taybetî heger me li maneya kîta "hal" (hel) bi kurdî temaşe kir, ew tê maneya "bilîndbûnê". Min ji hin dapîrên me pir dibihîst dema digotin "hilo" yanê rabe ser xwe. Ev kîta "hil" ku di kurdî başûr da bi şêwazê "hel" tê gotin di zimanê me da pir heye; wek "hilperikî", yanê çû jor û "hildan", yan rakir jor û wisa jî "serhildan", yanê li hember dijmin serî rakir jor, yanê "şoreş" pêkanî. Ev peyv di kurdiya başûr da bi şêwazên "heldan" û "serheldan" tên gotin.

Duwem: Şêwazê "*Khawirtî*" (Xawertî) peyva kurdî "*xûr*" û "*xawer*" tîne bîra me, yanê tê maneya "roj, tav". Ev peyv bi şêwazên "hor" û "sor" jî tê. Parkîta "ti" (tî) wek ku tê zanîn di zimanê kurdî da rengdêrê dike jêder; wek peyvên (aş ---> aşî), (hovî ---> hovîî), (kole ---> koletî), (serbest ---> serbestî) û hwd. Ji lew ra, bi her hal, peywendîya peyva "*Xawertî*" bi ayîna rojeyî (şemsanî) ra heye. Heya niha jî şopa vê peyvê di navê bajarê "*Khorramabad*" (Xûrem-Abad), paytextê herêma Loristan da maye û herwisa di navê bajarê "*Khorramshahr*" (Xûram-Şahr) da li herêma Xozistanê. Ev bi erebî "*Muhemereh*" (المُحَمَّرَة) tê gotin, ku ev jî wegereka temamî ye ji peyva "*Xûrem*" ra ku di bermaya kurdistanî da bi maneya "sor, roj" heye. Maneya navên "*Khorramabad*, *Khorramshahr*" tê maneya (bajarê rojê).



Dîmenek ji şarê Khorramabad

Di navbera hezarsala pêncemîn b.z. da, yanê di dema ku *Sûmerî* ji herêma bakur-rojavayê çiyayên Zagros daketin deştên başûrê Mêzopotamiyayê, di wê demê bi xwe da jî *Êlamî* ji

herêmên başûrê çiyayên Zagros daketin deştên berhemdar li Êlam, Loristan û Xozistanê ku çemên ji çiyayên Zagros hildavêjin di wir ra derbas dibin û dikevin kendava sûmerî (farisî). Yek ji wan çeman çemê "Karkheh" (Kerxeh)-e (كَرْخَه) ku navê wî ye kevin "Tiri" (Tîrî) ye û çemê "Karûn" (bi erebî Qarûn) (قارون) û çemê "Diz" ku dibe çemê "Dizfûl" be û ji navê wî navê bajarê "Dezful" (Dizfûl) li Xozistanê hatiye. Di wê demê da di deştên Êlamê ra rêyên bazirganiyê ku welatên Sind û Hind li rojhilat bi Mêzopotamiya ra li rojava girêdidan, derbas dibûn³.



Dîmenek ji çemê Karûn



Dîmenek ji çemê Dizfûl

Du - Raha Êlamiyan:

Dîrokzan dibêjin ku Êlamî ne ji Samiyên ku ji biyabanê hatine ne û ne jî ji Ariyanane, ji ber ku xuyakirina wan pêş xuyakirina Ariyanan li rojavayê Asiyayê bi dora hezar salî ye. Zaniyar li ser wê yekê li hev dikin ku Êlamî ji Zagrosiyên kevinin yên ku hin zaniyar wan bi nijadê "Asiatic" (Asiyawî) bi navdikin, hinek jî wan wek "Zagros-elanite" bi navdikin û beşekî sêhem jî wan wek "Qoqazi" (Qefqasî) dihejmêrin⁴.

Piştî ku Mamoste Taha Baqir rahên *Êlamiyan* vedigerîne ser çiyayên Zagros, bi ser va tamam dike û dibêje: **"Hin neteweyên din jî ku bi her hal xizimên Êlamiyanin vedigerin ser vê herêmê, wek "Kaşşî", "Lolo" (herêma Şehrezor) û Gûtî (herêma Zapê jêrîn). Hinek jî lêkolîneran rahê zimanê kaşşî vedigerînin ser zimanê êlamî û dikin malbateka zimanî kevin ku wenda bûye û bingeha wê li başûrê Qefqasê ye"**⁵.

Hesen Muhyeddîn El Se'dî (السَّعْدِي) dibêje, hin lêkolîner dibînin ku nijadê "Asiyanic" (Asiyawî) bingeha şaristaniya rojavayê Asiyayê bi giştî ye û **"Êlamî, Kaşşî, Ûrartûyî, Hittî û Mîttanî û hin komên din jî ku bi yek zimanî diaxivîn û bi yek ayîne bawer dikirin ku li ser bingeha perestina dayîkê hatiye avakirin û dayîk bi peykerên pîroz dane xuyakirin"**⁶.

Hesen Muhyeddîn El Se'dî bi ser va zêde dike û dibêje: **"Êlamî û xizimên wan jî neteweyên çiyayî ti yekîtiyeka siyasî ew nedicivandin, tevî ku zimanên wan dişibihîn hev û ew jî yek nijadî bûn. Lê belê, Êlamî li pêş wan giştan ketin heyama dîrokî, dewleteka siyasî serbixwe avakirin, û malbateka wan ya serdar hên jî destpêka hezarsala sêhem b.z. da hebû"**⁷.

Zaniyar Dyakonov jî hêla xwe da mijara peywendiya *Êlamiyan* li gel neteweyên zagrosî yê din gengeşe dike û dibêje. **"Ji navên erdnîgarî yê hezarsala yekem b.z. tê xuyakirin ku Êlamî di demên pir kevin da li rojhilatê Mîdiya dijiyan"**⁸. Dyakonov *Gûtî û Êlamiyan* jî gelên Mîdiya dihejmêre; ew dibêje: **"Jêderên aşûrî peyva "Matay" danîne hember peyva "Maday" û "Amaday", û tê maneya yekîtiya neteweyên Mîdiya yê ku rahên wan êlamî ne"**⁹.

Ev hemû belge û pir begehên din jî hene, ti gumanê têda nahêlin ku peywendiyeka erdnîgarî, nijadî, zimanî û çandî di navbera *Êlamiyan* û pêşiyên Kurdan yê din da (*Lolo, Kaşşû, Gûtî, Ûrartû, Mîdî*) heye, ewên ku li erdnîgariya çiyayên Zagros û derdorên wan dijiyan; ev herêma ku ji başûrê Qefqasê da li bakur heya bi Xozistanê li başûr dirêj dibe. Ev rastî bû sedem ku em *Êlamiyan* têxin nav koma pêşiyên Kurdan, û divêt bi taybetî dîrokzanên Kurdan û bi gelemperî rewşenbîrên Kurdan jî girîngiyeka mezin bidin vê mijarê.

Çarşemb, 26.08.2015

Jêder

¹ Cegerxwîn: Dîroka Kurdistan, c 1, rûpel 9.

² Taha Baqir: Dîroka Îranî ya kevin, rûpel 25, 26. Jean Bottéro û kesên din: Rojhilata Nêzîk û Şaristaniyên destpêkî, rûpel 25. Hesen Muhyeddîn El Se'dî: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da, rûpel 241. Elisabeth Carter and Matthew W. Stolper, University of California Press. 1984, p. 3. Jeremy Black, Andrew George & Nicholas Postgate (eds.), ed. (1999), A. Concise Dictionary of Akkadian. p. 68.

³ Hesen Muhyeddîn El Se'dî: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da, rûpel 241. Taha Baqir: Dîroka Îranî ya kevin, rûpel 25.

⁴ Taha Baqir: Pêşgotinek di şaristaniyên kevin da, rûpel 632. Remedan Ebdeh Elî: Dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin û şaristaniyên wê, rûpel 61. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 548. Hesen Muhyeddîn El Se'dî: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da, rûpel 225.

⁵ Taha Baqir: Dîroka Îranî ya kevin, rûpel 26.

⁶ Hesen Muhyeddîn El Se'dî: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da, rûpel 225.

⁷ Hesen Muhyeddîn El Se'dî: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da, rûpel 240.

⁸ Dyakonov, Mediya, rûpel 105.

⁹ Dyakonov, Mediya, rûpel 146, 147.